

Nexweşiya arterî ya perîferîk – Agahîyên dibe ku hûn bikêrhatî bibînin berî tedawiya bi Xarelto® (rîvaroksaban)

Hûn van agahîyan werdigirin ji ber ku doktorê we bo tedawiya nexweşiya arterî ya perîferîk ji we re Xarelto reçete kiriye. Ev agahî wê arîkariya we bike bo têgihiştina nexweşiyê, û ka bo çî giring e hûn Xarelto wergirin bi reçeteyê.

Ji bo zêdetir agahdarî di derbarê nexweşiya arterî ya perîferîk de, hûn dikarin têkilî bi doktorê xwe re deynin, an jî biçin malpera www.benartarsjukdom.se.

Ji bo agahiyên hûrgilî yê bikarhêner, li ser belavoka di pêçana dermanê de heye binihêrin, an jî herin www.fass.se.

Çima hewcetiya min bi tedawiyê re heye?

Nexweşiya arterî ya perîferîk pirî caran bandore li ser rehên xwînê yê lingan dike – arterên perîferîk – di vê rewşê de carinan wekî nexweşiya arteriya lingan tê binav kirin.¹

Nexweşî gava komikên dohnê di arteran de çêdibin destpê dike, herikina xwînê asteng dike. Piştî vê hûn ê dest bi tecrûbe kirina semptoman dikin weke êşa di lingan de, ji ber ku masûlên lingan ji çenda werdigirin

zêdetir hewcetîya wan bi oksîjenê heye. Ev rewş bi piranî têtê fam kirin dema ku hûn li derve ne û meşin/bi rêve diçin.¹ Ev nexweşî jî carinan wekî "nexweşiya çavdêriya pencereyê" tê binav kirin.

“Mirov tê na anîn der ku we nexweşiyek heye – difikirin ku hûn bi tenê rawestine û li pencereya dikanekê dinêrin.”

Xeter kêr kirin

Carinan, gilêyeke xwînê li ser komika dohnê pêktê, rê li ber tevavî astengbûna arteran verdike. Heke ev qewime, hewcetî bi operasyonekê heye bo hewldana sererastkirina herikina xwînê, û bi vî awayî xetera ampûtasyonê kêr kirinê.^{2,3} Bi bextewarî, hûn û doktorê we dikarin bi hev re bixebitin da ku xetera ku ev ji we re diqewime kêr bike.

Çima Xarelto®?

Doktorê we Xarelto reçete kiriye, ligel asîda asetîlsalîsîlîk, weke parçekî plana tedawiya we bo nexweşiya arterî ya perîferîk. Sedema vê yekê ew e ku xetera çêbûna gilêya xwînê ya di rehên xwînê yê perîferîk de kêr bike.

Xarelto çî ye, û asîda asetîlsalîsîlîk çî ye?

Xarelto dermanek e ku bi teniktir kirina xwînê xetera çêbûna gilêyên xwînê di rehên xwînê yê perîferîk de kêr dike. Asîda asetîlsalîsîlîk jî dibe sedema tenik bûna xwînê.

Ez ji ber çî her dûyan pêk ve wergirim?

Asîda asetîlsalîsîlîk û Xarelto xwînê bi rêyên cuda tenik dikin, û şûna wergirtina yekê ji wan, pêk ve wergirtina wan bi bandortir e.

Kombînasyona Xarelto û asîda asetîlsalîsîlîk xetera fecr bûnê, krîza dilî an jî ampûtasyonê bi bandortir kêr dike şûna asîda asetîlsalîsîlîk bi tenê.

Xarelto® û asîda asetîlsalîsîlîk çawa dixebite?

Xarelto pir bûna tora fibrîn (tora gilêyên xwînê pêk tîne) kêmtir dike, di heman demê de asîda asetîlsalîsîlîk çalakandina trombositên (hucreyên torê bi derdorê ve girêdin) kêmtir dike. Bi hev re, xetera çêbûna gilêya xwînê di rehên we yên xwînê yên periferîk de kêmtir dibe.

Divê ez çawa Xarelto® û asetîlsalîsîlîk wergirim?

Divê hûn rojê du caran Xarelto wergirin, û rojê carekê asetîlsalîsîlîk wergirin. Çend vebijêrk hene hûn dikarin bikar bînin da ku hûn wergirtina dermanê xwe ji bîr nekin. Ma hûn bi gelemperî her roj di heman demê rojê de xwarinê dixwin? An jî, tiştek heye ku hûn rojê du caran bikar tînin (weke firça we ya dirana)?

Asîda asetîlsalîsîlîk 75 gr, rojê carekê (spêdê AN Jî êvarê). **Xarelto 2.5 mg**, rojê du caran (spêdê Û êvarê).

Tu carî ji bo cihê tijîkirina dozeke we jibîrkirî du dozên Xarelto an jî asetîlsalîsîlîk ne wergirin.

Heta kengî divê ez Xarelto® wergirim?

Heta kengî divê tedawiya we domîne wê ji aliyê doktorê we ve were destnîşankirin.

Çiyê din heye divê ku ez bizanim di derbarê wergirtina Xarelto® de?

Karta nexweşê

Dê ji we ra kartekî nexweşê were dayîn ku karkerên tenduristiyê agahdar dike ku hûn dermanekê tenikkirina xwînê werdigirin. Vê nîşanê hemî doctor, diransaz û hevşîreyên we tedawî dikin, bidin û her dem ligel xwe bigirin (wekî mînak, di cizdanka xwe de bigirin), ji bo di rewşeke wekî hûn bikevin nav qezayekê an jî bi giranî nexweş bikevin.

Ez dikarim çiyê din bikim?

Ji bîr nekin ku gelek giring e hûn dermanên xwe gorî rêwerzên doktorê xwe wergirin. Lê belê, tiştên din jî hene ku hûn dikarin bikin bo baştir kirina rewşa rehên xwe yên koroner:³

- ◆ Cigare kêşanê bihêlin
- ◆ Berdewamî rahênan bikin
- ◆ Heke hewce be kêloya xwe kêmtir bikin
- ◆ Bijûndar bixwin

Heke we bi zêdehî Xarelto wergirtibe®

Heke we zêde heb wergirtibin bilez têkilî ligel xizmeta tenduristiyê deynin. Gava we gelek Xarelto wergirt xetera xwînîbûnê zêde dibe.

Tesîrên rexnak

Hemî derman dikarin bibin sedema tesîrên rexnak, lê ne hemî bikarhêner bandor jê digirin. Heke we dest bi xwînîbûnê kiribe ji (bo nimûne) kepî, dev, mîz kêş, an jî zik/rûvîyan tekilî bi dezgeha tenduristiyê deynin. Heke hûn bi giranî xwînîdibin, an jî xwînîbûna bi xwe ne sekine hebe, divê hûn biçin xizmetên tenduristiyê yên lezgîn. Heke hûn derbekî giran ji zik, sing an jî ji serî wergirtibe, dîsa divê hûn biçin xizmetên tenduristiyê yên lezgîn bo kontrolê da ku hûn piştrast bin ku we xwînîbûna hindurî nîne. Herweha herin xizmetên tenduristiyê yên lezgîn heke hûn zêde singê, westabûn, rengavêtin, sergêjî, serêşî, werimîna bêyî sedemekî diyar, bêhtengiya zêde dibe, êşên singê an jî spazma vaskulîn(angina pectoris) – semptomên dibe ku bibe nîşaneke xwînîbûnê tecrûbe dikin.

Ligel dermanên din

Bêyî ji ewil serlêdana doktorê xwe kirinê, dermanên dijî-nêmgirtinê yên wek (mînak) Voltaren, Naproxen, an jî zêde asîda asetîlsalîsîlîk ne wergirin. Hebên êşê yên ku di naveroka xwe de parasetamol digirin, weke Alvedon an jî Panodil, hûn dikarin ligel Xarelto wergirin. **Girîng e ku hûn doktorê xwe li ser her dermanên din ên ku hûn bikar tînin agahdar bikin – ev yek ji bo dermanên bêreçete tînin û dermanên siruştî jî derbasbar e. Heke hûn dermanên antîdepresan ên tîpa SSRI bikar tînin, divê hûn doktorê xwe jî li ser vê yekê agahdar bikin.** Doktorê we dê biryar bide ka hûn ê çawa tedawiya xwe berdewam dikin.

Tengkirinî

Têkilî bi doktorê xwe deynîn:

- ◆ heke hûn ji rîvaroksaban, an yek ji wan dermanên din ên Xarelto di naveroka xwe de digire alerjiya we hebe an jî pirole hesasin
- ◆ heke hûn bi giranî xwînîbûyine, an jî xwînîbûyina berdewamî tecrûbe dikin
- ◆ heke we nexweşîyeke cîger hebe, an jî nesaxîyeke din ku dibe sedema xetera xwînîbûnê
- ◆ heke hûn ducanî ne an jî şîr didin
- ◆ heke we emelîyatek an jî bîyopsîya plansaz kirî hebe

Heke hûn ê (bo mînak) diranekê derxînin, têkilî bi diransazê xwe re deynin, û wî/ê agahdar bikin ku hûn tedawiye bi Xarelto dibînin. Heke hûn ducanîbûnê plansaz dikin têkilî bi doktorê xwe re deynin.

JÎ KEREMA XWE RE BALA XWE BÎDÎN: Ev broşur cihê şêwir û rêwerzên ji aliyê doctor we û karkerên tenduristiyê tînin dayîn nagire.

Çavkani:

1. Mayo Clinic. Peripheral artery disease (PAD). Symptoms and causes. Online li: <https://www.mayoclinic.org/diseases-conditions/peripheral-artery-disease/symptoms-causes/syc-20350557> [erî dawîn li Gulan 2020'ê hatiye dîtin].
2. NHS Choices. Atherosclerosis (arteriosclerosis). Online pî: <https://www.nhs.uk/conditions/atherosclerosis/> [erî dawîn li Gulan 2020'ê hatiye dîtin].
3. Mayo Clinic. Peripheral artery disease (PAD). Diagnosis and treatment. Online pî: <https://www.mayoclinic.org/diseases-conditions/peripheral-artery-disease/diagnosis-treatment/drc-20350563> [erî dawîn li Gulan 2020'ê hatiye dîtin].

Xarelto (rivaroxaban), antitrombotîskî medel, **R** (B01 AF01). Tabletter 2,5 mg (F). **Indikation:** Xarelto, i kombination med acetylsalicylsyra, är avsett för att förebygga aterotrombotiska händelser hos vuxna patienter med kranskärlssjukdom eller symptomatisk perifer kärlsjukdom med hög risk för ischemiska händelser. **Dosering:** Den rekommenderade dosen är Xarelto 2,5 mg två gånger dagligen, i kombination med en daglig dos om 75–100 mg acetylsalicylsyra. Behandlingslängden ska fastställas för varje enskild patient baserat på regelbundna utvärderingar med hänsyn tagen till risken för trombotiska händelser kontra blödningsrisk. **Kontraindikationer:** Överkänslighet mot den aktiva substansen eller mot något hjälpämne. Aktiv, kliniskt signifikant blödning. Organskada eller tillstånd, som anses utgöra en ökad risk för större blödning. Samtidig behandling med andra antikoagulantia. Samtidig behandling av akut koronart syndrom i kombination med trombocyttagregationshämmande behandling hos patienter med tidigare stroke eller en transitorisk ischemisk attack (TIA). Samtidig behandling av kranskärlssjukdom/perifer kärlsjukdom med acetylsalicylsyra hos patienter med tidigare hemorragisk eller lakunär stroke, eller någon form av stroke inom en månad. Leversjukdom förknippade med koagulopati och kliniskt relevant blödningsrisk inklu-

sive cirrotiska patienter med Child Pugh B och C. Graviditet och amning. **Varningar och försiktighet:** Vid tillstånd med ökad blödningsrisk bör Xarelto användas med försiktighet. Administrering av Xarelto bör avbrytas om svår blödning uppstår. Xarelto ska användas med försiktighet hos patienter med kreatininclearance 15–29 ml/min. Användning av Xarelto hos patienter med kreatininclearance < 15 ml/min rekommenderas inte. Xarelto bör användas med försiktighet hos patienter med kranskärlssjukdom/perifer kärlsjukdom som är ≥ 75 år och samtidigt tar enbart acetylsalicylsyra eller acetylsalicylsyra och klopidogrel eller tiklopidin. Nyttan och risken med behandlingen ska regelbundet utvärderas för varje enskild individ. Datum för senaste översynen av produktresumén december 2022. Bayer AB. Box 606. 169 26 Solna. Tel. 08-580 223 00. För ytterligare information samt priser se www.fass.se. Före förskrivning vänligen läs produktresumén på fass.se MA-M_Riv-SE-0142-3. December 2022.

Översättningen är utförd av *LanguageWire*, ett professionellt ISO9001:2015-certifierat översättningsföretag med kompetens att översätta från svenska till kurdiska. Vi intygar härmed att denna översättning, enligt vår professionella kunskap, motsvarar dokumentet *Patientbroschyr (PAD)* på svenska.



Bayer AB
Box 606, 169 26 Solna
Tel: 08-580 223 00